Dê û Bavên birêz,

Hûn dikarin zarokên xwe di waneyên zimanê kurdî de tomar bikin, heger zimanê malbata we bi kurdî be û kurdî ji we û zarokên we re wek zimanê zikmakî be. Ziman û Kultûrê kurdî ji zarokên we re dibe beşek sereke ji nasnameya wan, pêwîstîyek giring bi ziman heye jibo pêşxistina kesayetîya zarokan. Gelek xwendinên zanistî teqez dikin ku bi hêzkirina çalakîyên zimanê dayikê dibe alîkar jibo fêrbûna zimanê elmanî bi şêweyekî baştir, nemaze zarok dikarin di heman demê de fêrî du/sê zimanan bibin; ev tê wateya ku zarok dikarin kurdî û elmanî di heman demê de fêr bibin. Di waneyên zimanê kurdî de zarok fêrî xwendin û nivîsîna bi kurdî dibin, fêrbûna zimanê dayikê zengînbûnek û rengekî rewşenbîrî ye jibo Elmanyayê. Her zarokek başqe tê wêrandin, xwendekar bawernameya tevlîbûnê werdigirin û encama ezmûnê dê li ser bawernameya dibistanê bê nivîsîn, waneyên zimanê kurdî pêşinyarek taybet e jibo xwendekarên koçbûyî. Hûn dikarin tomarkirina xwe bidin dibistanê. Waneyên kurdî di roja pêncşemê de ji seat 15:00 ta seat 16: 30 û roja înê ji seat 14:30 ta seat 16: 30 tên dan. Ez kêfxweşim ji bo piştrastiyî û miqatebûna we. Heger pirsên we hebin hûn dikarin bi birêveberiya dibistanê re têkilîyê bikin yan bi mamostyê ziman Birêz Idrees Amin re pêwendîyê di rêya E-Mail: idriscan1@gmail.com û nimreya Telefonê: 01629789316 bikin.